ResearchGate

See discussions, stats, and author profiles for this publication at: https://www.researchgate.net/publication/322025704

Bîbliyografyaya Melayê Cizîrî / The Bibliography of Malaye Jiziri

Article · December 2017

DOI: 10.19059/mukaddime.364334

CITATIONS
0

READS
89

3 authors, including:



Yakup Aykac
Mardin Artuklu Üniversitesi

2 PUBLICATIONS **0** CITATIONS

SEE PROFILE

All content following this page was uploaded by Yakup Aykac on 19 October 2018.

The user has requested enhancement of the downloaded file.

Mukaddime, 2017, 8 (Özel Sayı 1), ö171-ö199
doi: 10.19059/mukaddime.364334

Bîbliyografyaya Melayê Cizîrî

Abdurrahman ADAK[i] – Hayrullah ACAR[ii] – Yakup AYKAÇ[iii]

Kurte: *Dîwan*a Melayê Cizîrî di nav edebiyata kurdî de yek ji navdartirîn û berbelavtirîn behemên edebî ye. Ji ber vê yekê jî gelek destnivîs, çap, şerh û wergerên wê hene. Herwiha derheqê Mela û Dîwana wî de vê dawiyê gelek xebatên lêkolînî jî hatine kirin. Mirov dikare bibêje ku di edebiyata kurdî de ji aliyê bîbliyografya û lîteraturê ve Melayê Cizîrî û Dîwana wî di asteke gelekî bilind de ye. Ev nivîsar jî li ser Melayê Cizîrî û *Dîwan*a wî xebateke bîbliyografîk e. Armanca vê nivîsarê, di çarçoveya zanista bîblîyografyayê de tesbîtkirin, berhevkirin û nasandina xebatên têkildarî Melayê Cizîrî ne. Rabirdûya xebatên li ser Melayê Cizîrî, nasandina hin xebatên lêkolînî yên girîng û amadekirina lîsteyên bîbliyografîk bi awayekî sîstematîk mijarên bingehîn ên gotarê ne. Biwarên ku lîsteyên wan hatine amadekirin ev in: Nusxe û çapên *Dîwan*a Melayê Cizîrî, pirtûkên lêkolînê yên li ser Mela, şerhên *Dîwan*a Melayê Cizîrî, tezên zanîngehan, meqale û ansîklopediyên akademik, teblîxên sempozyum û konferansan û nivîsarên kovarên populer.
Peyvên Sereke: Mela Ehmedê Cizîrî, *Dîwan*a Melayê Cizîrî, Helbestên Melayê Cizîrî, Bîbliyografyaya Melayê Cizîrî.



The Bibliography of Molla al-Jazari

Abstract: Molla al-Jezeri's Diwan is one of the most famous and widespread literary works of Kurdish literature. Consequently there have been a lot of manuscripts, copies, commentaries and translations of Diwa. Many researches have also been conducted on Molla and his diwan in recent years. Therefore, Molla al-Jezeri and his Diwan possess a high position in Kurdish literature in terms of bibliography and litterateur. This article is a bibliographic study on Molla al-Jezeri and his Diwan. It has objectives such as determination, compilation and introduction studies relevant to Molla al-Jezeri. The history of studies relevant to Molla al-Jezeri, introduction

i Doç. Dr., Mardin Artuklu Üniversitesi, Edebiyat Fakültesi, Kürt Dili ve Edebiyatı Bölümü, abdurrahmanadak@gmail.com.
ii Doç. Dr., Mardin Artuklu Üniversitesi Edebiyat Fakültesi, Kürt Dili ve Edebiyatı Bölümü, hayrullahacar@hotmail.com.
iii Arş. Gör., Mardin Artuklu Üniversitesi, TYDE, Kürt Dili ve Kültürü Bölümü, aykacyakup@gmail.com.

Gönderilme Tarihi: 10.12.2017, Kabul Tarihi: 14.12.12017

of some prominent research studies and systematically preparation of a bibliographic list are main concerns of this study. In this study, the bibliography has been studied under the following sections: manuscripts and copies of Molla al-Jezeri's Diwan, research books on Molla, commentaries on Molla's Diwan, dissertations and academic articles, book chapters, symposium and conference presentations and popular journal articles.
Keywords: Molla al-Jazari, Molla al-Jazari's Diwan, Bibliography of al-Jazari.

Melayê Cizîrî Bibliyografyası

Öz: Melayê Cizîrî'nin Divanı, klasik Kürt edebiyatında en ünlü ve en yaygın edebî eserlerden bir tanesidir. Bundan dolayı Divanın birçok elyazma nüshası, kitap baskısı, Divan şerhi ve çevirileri mevcuttur. Özellikle son dönemlerde Mela ve Divanı'yla ilgili birçok araştırma yapılmıştır. Bunu rahatlıkla ifade edebiliriz ki klasik Kürt edebiyatında Mela ve Divanı'yla ilgili çalışmalar bibliyografik ve literatür olarak ileri bir seviyeye ulaşmıştır. Bu makale Mela ve Divanı'yla ilgili bibliyografik bir çalışmadır. Bu araştırmanın amacı Melayê Cizîrî ile ilgili yapılan çalışmaları akademik bibliyografya çerçevesinde tespit etmek, toplamak ve tanıtmaktır. Cizîrî ile ilgili yapılan geçmişteki çalışmalar, akademik bazı önemli çalışmaların tanıtımı, sistematik bir şekilde bibliyografik listelerin hazırlanması bu makalenin temelini oluşturmaktadır. Bibliyografya, bu çalışmada şu başlıklar altında incelenmiştir: Yazma nüshalar ve Divan'ın baskıları, Mela ile ilgili araştırma kitapları, Mela'nın Divan'ın şerhleri, Mela İle İlgili akademik tezler, makale ve ansiklopedi maddeleri, sempozyum ve konferans tebliğleri ile popüler edebiyat ve kültür dergileri.
Anahtar Kelimeler: Mela Ehmedê Cizîrî, Melayê Cizîrî Divanı, Melayê Cizîrî şiirleri, Melayê Cizîrî bibliyografyası.

Destpêk

Peyva "bîbliyografya"yê ku îro wek gelek zimanên cîhanê di zimanên kurdî de jî tê bikaranîn ji "bibliographie"ya frensî hatiye wergirtin. Ev peyv ji aliyê morfolojîk ve peyveke hevedudanî ye ku ji du hêmanên (navdêrek û raderek) grekî hatiye sazkirin: *biblion* 'pirtûk' û *graphein* 'nivîsîn'. Lêbelê îro wek têgeheke zanistên sosyal bîblîyografya, bi wateyê "repertuara navên pirtûkan" tê bikaranîn. Dema em li rabirdûya bikaranîna vê têgehê dinêrin, em dibînin ku cara yekem di sedeya II. de hekîmê yewnanî Klavdios (Claudius) Galenos (m. 210) di kitêba xwe ya bi navê *De Libris Propris* de peyva bîbliyografyayê di wateya lîsteya berheman de bi kar aniye ku ev wate hevterîbê wateya zanistî ya roja me ye. Piştre em dibînin ku li Rojava gelek keşîş û dîroknasan berhemên bîbliyografîk nivîsîne (Malclés û yd., 2003: 15).

Eger em ji Rojava berê xwe bidin Rojhilatê, em dibînin li nav miletên misliman ji bo bîbliyografyayê têgehên wek "esami'l-kutub" (navên berheman), "'ilmu'l-kutub" (zanista berheman) û "kîtabiyat" (berhemnasî) hatine bikaranîn

ku ev têgeh tev bi zimanê erebî ne. Bi rastî jî şaristaniya ku mislimanan ava kiriye, di warê zanist û nivîsînê de gelekî pêş ketiye û di encamê de di nav vê şaristaniyê de di qadên curbicur de yekûneke mezin berhem derketine holê. Loma jî di navmiletên misliman de gelek alim û nivîskar hene ku kitêbên beriya xwe qeyd kirine û derheqê wan de agahî dane. Berhema Îbn Nedîm (m. 990) ya bi navê *el-Fihrist* û berhema Katip Çelebî (m. 1657) ya bi navê *Keşfu'z-Zunûn* di vî warî de wek du nimûneyên girîng dikarin bên dayîn (Muneccid, 1976: 33-40; Durmuş, 2002: 26/ 83-85). Tiştekî zelal e ku van xebatên bîbliyografîk rê li ber lêkolînerên wê demê vekiriye û di xebatên wan de hêsaniyek pêşkêşî wan kiriye.

Di sedsalên dawî de bi zêdebûna zanyarî, lêkolîn, pirtûk û xebatên nivîskî girîngiya bîbliyografyayê hindî çûye zêdetir bûye û vê jî di nav qadên zanistî de bîbliyografya wek şaxeke serbixwe ya zanistê derxistiye pêş. Zanista bîblîyografyayê li ser jêderan radiweste ku di telîfa berhemekê de tên bikaranîn û, lîste û nivîsên berheman didin nasandin. Di vê zanistê de wek rêbaz berhemên ku li ser mijareke taybet û bi piranî di serdemeke taybet de hatine nivîsîn û weşandin bi awayekî tam û sîstematîk tên lîstekirin. Bîblîyografya ji hin aliyan ve di nav xwe de tê dabeşkirin jî. Ji van dabeşkirinan a herî girîng dabeşkirina wê ya li gorî vegirtinê ye. Ji vî aliyî ve, bîblîyografya wek bîblîyografyayên giştî û yên taybet li ser du beşan tê dabeşkirin. Bi giştî eger bîblîyografya hemû berhemên qadekê vegire ew bîbliyografyayeke giştî ye, herwiha eger berhemên mijareke spesîfîk vegire ew jî bîbliyografyayeke taybet e (Durmuş, 2002: 26/ 83-85).

Di amadekirina xebatên bîbliyografîk de armanca yekem çi çapkirî û çineçapkirî, nasandina hemû berhemên biwareke taybet e.Ji van aliyan ve bîbliyografya ji katalogên ku berhemên pritûkxaneyan didin naskirin vediqete. Bixêra bîbliyografyayê lêkolîner gava di mijarekê de xebatekê bike, pê dihese ka beriya wîdi wê mijarê de çi xebat û lêkolîn hatine kirin. Ew jî dibe sedem ku xebat hev dubare nekin û xebatên pêştir û xurtir derbikevin (Durmuş, 2002: 26/ 83-85; Aykaç, 2017: 120).

Kurdolojî qadeke berfireh a zanistên sosyal e ku bi taybetî di divan sed salên dawî de li gelek dewletên cîhanê û li nav kurdan bûye mijara lêkolînên curbicur. Gramera Garzoniyê Îtalî vê kêliyê di qada Kurdolojiyê de wek berhema herî kevin a çapkirî tê qebûlkirin. Aşkera ye ku ji sala 1789an ku berhema Garzonî hatiye çapkirin, heta bi roja me berhem û xebatên ku di qada kurdolojiyê de hatine çapkirin digihîjin kojimeke mezin.

Piştî ku rojhilatnasan bi taybetî di sedsala XIXan de li ser kurdolojiyê xebatên curbicur kirin, di sedsala XXan de jî bi rêzê li Stenbol (di dawiya Osmaniyan de), Iraq, Sûriye, Ewropa, Tirkiye û Îranê xebatên kurdolojiyê gelekî pêş ketin. Li Tirkiyeyê piştî salên 1990î weşangeriya kurdî gelekî pêş ket û ji wê salê heta roja me bi awayekî nedîtî kitêb û kovar derçûn. Dîsa li Tirkiyeyê piştî 2000an di warê Kurdolojiyê de hin gavên nûhatin avêtin û li hin zanîngehan beşên kurdolojiyê vebûn. Di vê navberê de di warê kurdolojiyê de gelek sempozyum, konferans hwd. hatin lidarxistin û çalakiyên curbicur ên çandî, edebî hwd hatin kirin. Di encamê de

van weşan û tevgerên zanistî xebat û lêkolînên di biwara kurdolojiyê de her ku çû zêde bûn.

Bêguman ev wêneyê giştîyên berhem û xebatên biwara kurdolojiyê hebûna bîbliyografyayan pêwist didêre. Bi rastî jî ji bo tesbîtkirin û nasandina van xebatan, pêdivî bi bîblîyografyayên curbicur hene. Wek hemû qadên din, ji bo kurdolojiyê jî hem bîbliyografyayên giştî yên kurdolojiyê, hem jî bîblîyografyayên mijarên taybet dikarin bên amadekirin. Helbet heta nihali ser Kurdolojiyê hin bîbliyografya hatine amadekirin, lêbelê digel girîngiya van xebatên heyî, pêwist e ev qad bê pêşxistin, di vî warî de xebatên nû bên kirin û valahiya heyî bê dagirtin. Ji bo mijar temam bibe, li vir em dixwazin çend nimûneyan ji bîblîyografyayên heyî pêşkêş bikin: *Bîbliyografyayî Du Sed salî Kitêbî Kurdî 1787-1987* (Mustafa, 1988), *Kürdoloji Bilimin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987)*(Alakom, 1991)*, Bîblîografiay Kitêbî Folklorî Kurdî (1860-2004)* (Nûredîn, 2004), *Rêberî Bîbliyografiye Kurdiyekan*(Yabe, 2006)*, Ferhenga Edîb û Nivîskarêt Devera Behdînan* (Ridînî, 2006)*, Rêberî Name Ekadîmiyekanî Zimanî Kurdî* (Yabe, 2006)*, Îndêksî Govarî Korî Zanyarî Kurd* (Yabe, 2006)*, Bîbliyografyayî Kurdnasî* (Ebdulla, 2009)*, Bîbliyografyayî Akadîmyayî Kurdî (Emîn, 2010), Bîbliyografyayeke Weşanên bi Îngilîzî li ser Folklora Kurdan* (Keskîn û Pertev, 2015)*, Bîbliyografyaya Tezên Beşên Kurdolojiyê yên li Tirkiyeyê (2011-2016)* (Aykaç, 2017).

Dema em li bîbliyografyayên Kurdolojiyê yên navborî dinêrin, em dibînin ku heta niha bi piranî bîblîyografyayên giştî yên Kurdolojiyê hatine amadekirin. Aşkera ye digel bîblîyografyayên bi vî rengî, pêdivî bi amadekirina bîblîyografyayên taybet û spesîfîk jî heye. Hem ji bo pêşxistina zanista bîblîyografyaya Kurdolojiyê, hem jî bi bo amadekirina bîblîyografyayên bi vî rengî wek pêdiviyekê derdikeve pêşberî lêkolîneran. Dema em ji vê perspektîfê li qada bîblîyografyaya kurdolojiyê dinêrin, em dibînin ku yek ji kesayet û mijarên herî girîng kudemildest tê bîra me Melayê Cizîrî û Dîwana wî ye.

Melayê Cizîrî di sedeya 16 û 17an de jiyaye û helbestvanekî girîng û damezirîner ê edebiyata kurdî ya klasîk de. Di dîroka edebiyata kurdî de yekem dîwana muretteb a wî ye. *Dîwan*a Melayê Cizîrî ji serdema wî heta bi roja me li seranserê Kurdistanê di medrese û cimaetên kurdan de hatiye xwendin. Gelek helbestvanên kurd di helbestên xwe de di bin bandora Mela de mane, di hunera xwe de ew wek model wergirtine û şêwaza wî ya edebî şopandine. *Dîwan*a Mela hem berî derketina çapxaneyê, hem jî piştî wê gelek caran wek destnivîs hatiye istînsaxkirin/kopîkirin û ji salên 1900î heta bi roja me gelek caran di çapxaneyan de hatiye weşandin. Dîsa, ji bo dîwanê gelek şerh hatine nivîsîn û di zimanên din de wergerên wê jî hatine kirin (Adak, 2013: 186-210). Çawa tê dîtin *Dîwan*a *Mela* bala gelek lêkolîneran kişandiye û di encamê de lîtaretureke berfireh derheqê wê de derketiye meydanê. Loma meamadekirina bîblîyografyaya lîteratura Melayê Cizîrî û *Dîwan*a wî wek pêwistiyekê dit û ev gotar ji bo vê mijarê terxan kir.

Li vir wek heqşînasiyekê pêwist e em bibêjin ku li ser Melayê Cizîrî cara pêşî Îsmail Badî xebateke bîbliyografîk amade kiriye û di sala 2000an de li Dihokê di kovara *Vejîn*ê debelav kiriye. Xebata me di vî warî de dibe lêkolîna duyem. Lêbelê ji ber ku xebata Badî li Kurdistana Iraqê hatiye weşandin (Badî, 2000: r. 86-101), elîfbêya wê ya kurdî-erebî, ji bo têgihîştina wê,bi piranî, wek astengekê derdikeve pêş. Ji aliyekî dî ve ser xebata wî re 17 sal derbas bûne û di vê maweya dirêj de, li gelek deveran û bi taybetî jî li Tirkiyeyê (bi saya çêbûna atmosfereke nisbî xweştir ji bo xebatên Kurdolojiyê) gelek xebatên girîng û nû li ser Melayê Cizîrî hatine kirin. Loma me bi awayê ku gotara Badî jî vegire, digel tesbîtkirina xebatên ku piştî Badî hatine kirin û digel tesnîf û analîzan ev bîbliyografya amadekir.

Peykerê gotarê ji bilî destpêk û encamê li ser sê beşan ava bûye. Di beşa yekem de rabirdûya xebatên li ser Mela hatiye amadekirin, di beşa duyem de bi awayekî sîstematîk û li gor cureyan lîsteyên xebatên li ser Mela hatine pêşkêşkirin. Di vê beşê de xebatên li ser Mela jî bi şêweya Çapên *Dîwan*a Melayê Cizîrî, şerhên *Dîwan*a Melayê Cizîrî, werger, pirtûkên lêkolînê, tez, gotar, beşek ji pirtûkê, maddeyên ansîklopediyan, teblîxên sempozyum û konferensan, kovarên populer (kovarên hunerî, edebî, kulturî) û herî dawî jî rojnameyan hatine dabeşkirin. Di bin van sernavan delîsteyên hemûyan yek yek hatine rêzkirin. Di beşa sêyem de nirxandineke tematîk li ser xebatên bi Melayê Cizîrî re pêwendîdar hatiye kirin û di beşa çarem de jî hin berhemên girîng li ser Melayê Cizîrî hatine nasandin. Di dawiya gotarê de jî encameke kurt cih digire.

Di amadekirina vê bîbliyografyayê de me gelek jêder di ber çavan re derbas kirin. Hin ji van çavkaniyan bîbliyografyayên berê ne, hin kovarên populer in, hin jî malperên înternetê ne. Bîbliyografyayên berê ku meji wan sûd wergirtiye ev in: Bîbliyografyaya ku Îsmaîl Badî di kovara Vejînêdebelav kiriye, bîbliyografyaya ku Abdurrahman Adak di *Destpêka Edebiyata Kurdî* ya *Klasîk* de di beşa Melayê Cizîrî de amade kiriye (Adak 2013: 227-223), bîbliyografyaya ku Nesim Doru di *Melayê Cizîrî Felsefi ve Tasavvufi Görüşleri*de belav kiriye (Doru,2012: 247-248), b*îbliyografyaya ku Abdulcabbar Kavak di meqaleya xwe* ya bi navê "*Melayê Cizîrî'nin Divan Şerhleri Arasinda el-Ikdu'l-Cevherî fî Şerh-i Dîvani'ş-Şeyhi'l-Cezerî Adlı Eser*" de daye (Kavak, 2013: 53-67). Kovarên populer (hunerî û edebî) *yên ku me lê çavgerandine jev in:* Hetawî Kurd, *Hawar*, *Jîn*, *Ronahî*, *Nûbihar*, *Nûpelda*, *Nûdem*, *Zend*, *Roja Nû*, *Hêvî*, *Çira*, *Yazınca Dergisi*, *WarD îrok*, *Deng*. *Herwiha* jêderên *dîjîtal jî ev in:* Navenda Tezên Tirkiyeyê (https://tez.yok.gov.tr/UlusalTezMerkezi/), Navenda Tezên Îranê (https://irandoc.ac.ir/), Google Scholar (https://scholar.google.com.tr/), Navenda Kovarên Ilmî yên Tirkiyeyê (http://dergipark.gov.tr/), Kataloga Lêgerînê ya Giştî a Tirkiyeyê (http://www.toplukatalog.gov.tr/) Kataloga Lêgerînê ya Giştî a Navnetewî (https://www.worldcat.org/) û malpera akademisyenên cîhanê (https://www.academia.edu/). Me herwehaberhemên tarîxa edebiyata kurdî, anotlojiyên edebiyata kurdî, pirtûkên sempozyuman û nivîsarên kuheta niha nehatine tomarkirin jî li ber çavan girtin. M. Zahir Ertekin jî em ji hin meqale û pirtûkên ku li Kurdistana Iraqê û li Îranê weşiyane haydar kirin ku em bi vê helkeftê spasiyên xwe pêşkêş dikin.

1. Rabirdûya Xebatên li ser Melayê Cizîrî

Bi hêsanî dikare bê tesbîtkirin ku *Dîwan*a Melayê Cizîrî, ji aliyê belavbûna di nav kurdên kurmanc de di asta yekem de ye. Li gor tesbîtên me di serdema klasîk de bi qasî ku *Dîwan*a Mela di medrese û tekyayan de di nav zana û sûfiyan de belav bûye, tu berhemên dî yên kurmacî ewqas belav nebûne. Di serdema modern de jî di kategoriya dîwanan de ji aliyê bîbliyografya û lîteraturê ve *Dîwan*a Melayê Cizîrî di asta herî bilind de ye.

Lîteratura *Dîwan*a Mela wek destnivîs, çap, şerh, werger û lêkolînên zanistî li ser çar beşan dikarin bên dabeşkirin. Eger em hin awarteyan nehesibînin, em dikarin bibêjin ku kronolojiya xebatên li ser Mela bi vî rengî ye: Bi awayekî siruştî îstînsaxkirina *Dîwan*a Mela di qonaxa her kevin de ye. Aşkera ye ku gelek nusxeyên ku hatine istînsaxkirin de perspektîfeke zanistî jî heye. Dûre jî di çapxaneyan de gelek çapên Dîwanê çê bûne. Dûre gelek şerhên wê hatine kirin. Her dawî jî derheqê Mela û *Dîwan*a wî de lêkolînên zanistî yên curbicur hatine kirin.

Hin ji destnivîsên *Dîwan*a Mela li pirtûkxaneyên Îngilistan (Bodileian), Almanya (Marburg), Ermenistan (Erivanê), Stenbol û Ankarayê tên parastin. Bêguman gelek destnivîsên *Dîwan*a Mela di pirtûkxaneyên destnivîsan û koleksiyonên taybet ên kesayetên curbicur de hene.Li gor zanyariyên ber dest de vê kêliyê destnivîsa her kevin a *Dîwan*a MelaDestnivîsa Teyyar Paşayê Amêdîyê ye ku di sala1231/1815an de hatiye îstînsaxkirin (Tunç, 2008, 25).

Gava em li seyra tarîxî ya çapên Dîwana Mela dinêrin, em dibînin ku cara pêşî di sala 1904an de li Berlînê (Elmanya) ji aliyê Martin Hartmann ve hatiye çapkirin (Hartmann 1904). Cara duyem di sala 1337/1919an de li Stenbolê ji aliyê Mihemed Şefîq Erwasî ve hatiye çapkirin (Erwasî1337). Di navbera salên 1941-1943yan de ji aliyê Qedrî Cemil Paşa ve li Şamê di kovara Hawarê de qismen hatiye weşandin (Cemîl Paşa, 1941-1943). Di sala 1964an de li Hewlêrê ji aliyê Gîwî Mukriyanî ve hatiye çapkirin (Mukriyanî, 1946). Li Qahîreyê ji aliyê Mihemed Nûrî ve hatiye çapkirin. Di sala 1977an de li Bexdayê ji aliyê Sadiq Behaedîn Amêdî ve hatiye çapkirin (Amêdî, 1977). Di sala 1981ê de li Tehranê ji aliyê Hejar ve hatiye çap kirin. Dîwana Mela yekem car bi herfên latînî di sala 1987an de ji li Swêdê ji aliyê Zeynelabidîn Kaya û M. Emîn Narozî ve hatiye çapkirin. Piştî salên 90î li gelek ciyan hem bi tîpên erebî hem jî bi tîpên latînî gelek caran çap bûye.

Digel van nusxe û çapên *Dîwan*a Melayê Cizîrî gelek kesan jî li ser *Dîwan*ê şerh amade kirine. Di nav van şarihan de yê yekem Şêx Cercîsê Erbîlî ye ku di sala 1186/1772an de qesîdeya 'Hudûs'ê bi erebî şerh kiriye. Paşê Mela Yehyayê Mizûrî (k.d 1836) jî qesîdeya 'Muxbeçeya Meyfiroş' bi farisî şerh kiriye. Seyîd Ehmedê Gilirmanî bi erebî û farisî şerha qesîdeyeke Mela çêkiriye. Şêx Qedriyê (k.d. 1947) miftiyê Cizîrê beşek ji *Dîwan*a Mela bi erebî şerh kiriye. Piştî van şerhên qismî, yê ku cara ewil hemû helbestên Dîwanê şerh kirine Mela Ebdusselamê Westanî ye. Wî di sala 1958an de bi erebî, farisî û tirkî şerha xwe çê kiriye. Paşê li Cizîrê Mela Ebdusselamê Nacî (k.d. 1952) Dîwan bi zimanê erebî şerh kiriye. Ev şerh yekemîn şerha bi rêkûpêk e. Dû wan Mela Ehmedê Zivingî (k.d. 1971) tê ku wî şerha dîwanê

bi erebî çê kiriye û ji şerha Mela Ebdusselam Nacî sûd wergirtiye. Şerha ku herî zêde belav bûye ev e. Li hêla Îranê jî Ebdurrehman Şerefkendî (k.d. 1991) bi navê Hejar di sala 1361ê şemsî de bi soranî şerha dîwanê kiriye ku di qada xwe tene ye. Dîsa Cegerxwîn jî bi kurdîya kurmancî şerheke Mela çê kiriye lê ew hêjî çap nebûye. Abdulmukit Septioğlu jî nêzî 30 helbestên Mela bi tirkî şerh kirine. Celalettin Yöyler yekem car bi kurdiya kurmancî bi tîpên latînî şerha dîwanê amade kiriye. Mihemed Emîn Doskî jî bi kurmancî û bi tîpên erebî şerheke berfireh amade kiriye li Duhokê çap kiriye. Herî dawî Abdulbaki Turan di berhema xwe ya bi navê bi tirkî perçe perçe şerh kiriye. Ji bilî wan gelek kes hene ku tenê çend helbestên Mela şerh kirine (Adak, 2013: 202-205).

*Dîwan*a Melayê Cizîrî çi temamî çi jî qismî be, bi zimanên elmanî, farisî, erebî, îngîlîzî, tirkî û rûsî hatiye wergerandin (Kavak, 2013: 61). Di nav wan wergeran de du werger hene ku derketine pêş. Kerîmî Eyyûbî (1994) digel pêşgotineke dirêj *Dîwan*a Mela bi navê "Dîvan Gazêlêy" wergerandiye Rûsî û Osman Tunç (2009) jî bi tirkî wergera wê kiriye.

Van salên dawiyê jî gelek xebatên akademîk li ser ruxsar û naveroka dîwanê, nêrîna Mela ya felsefî û tesewufî hatine kirin. Herwiha hin xebatên berawirdî jî2 hatine kirin ku *Dîwan*a Melayê Cizîrî bi dîwanên din re di qadên curbicur de hatiye berawirdkirin. Di wan xebatên lêkolînî de ji aliyê kronolojîk ve ya ewil berhema Abdulbaki Turan (2010) a bi navê *Melayê Cizîrî Divanı Şerhi* ye. Dûre pirtûka Nesim Doru (2012) ya bi navê *Melayê Cizîrî Felsefi ve Tasavvufi Görüşler*, dûre *Melayê Cizîrî'nin Dîvân'ında Tasavvufî Mazmunlar* a Abdurrahim Alkış (2014), herî dawî jî berhema Safiye Zivingî (2017) tê ku bi zimanên erebî û kurdî derketiye ya bi navên *Cemaliyat ed-Delalati's-Sûfiyye fî el-Mu'cemi'l-Luxewiyye li Dîwani'l-Cezerî / Spehîtiya Watayên Sofîgeriyê di Ferhenga Zimanî ya Dîwan*a *Melayê Cizîrî de*.Em ê li jêrê di beşa nirxandinê de van xebatan yek bi yek bidin nasandin.

Piştî ku me bi awayekî kurt rabirdûya destnivîs, çap, şerh, werger û lêkolînên zanistî kir û kronolojiya van xebatan raxist ber çavan, em ê êdî derbasî hûrguliyên mijarê bibin.

2. Bîbliyografyaya Melayê Cizîrî li Gor Cureyen Xebatan

Me bîbliyografyaya Melayê Cizîrî li jêrê di çarçoveya cureyên xebatan de di bin dozde sernavan de senifandin. Ev cure bê rêzê ev in: Destnivîsên *Dîwan*ê, çapên *Dîwan*ê; şerhên *Dîwan*ê, wergerên *Dîwan*ê, pirtûkên lêkolînê, tezên akademîk, gotarên akademîk, beşên pirtûkan, maddeyên ansîklopediyan, teblîx û pêşkêşiyên sempozyum, kongre û konferansan,nivîsarên kovarên populer (Hunerî, Edebî, Çandî) û nivîsarên rojnameyan.

2.1. Destnivîsên Dîwanê

Li gor agahiyên ku Tehsîn Î. Doskî (Dîwana Melayê Cizîrî, "Pêşgotin", 2000), Îsmaîl Badî (2000) û Mîkaîl Nayîf Tahir (2005) di berhemên xwe de dane, destnivîsên *Dîwan*a Mela yên ku heta niha hatine tesbîtkirin ev in:

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), mustensix: Muhammed Teyar Paşayê Amêdîyê, tarîxa istinsaxê: 1231/1815, Ankara Milli Ktp. J. 06 Mil Yz A 5086/1

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), nusxeya ku Martin Hartmann li Stenbolê peyda kiribû û di sala 1904yan de li Berlînê çap kiribû.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), nusxeya ku di 1924an de li Stenbolê hatiye çapkirin.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), xwedî û mustensix: Mustafa Qeredaxî, sala istinsaxê: 1924.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), mustensix: Mustefa Qeredaxî, sal: 1924.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), el-Cezerî, Molla Ehmed, *Diwanu'ṣ-Sultani'l-Uşşaq we Qutbi'z-Zeman Mela Ehmed el-Cezerî*, îstînsax û şerh: Mela Ebdurrehîm el-Westanî, sala istinsaxê: 1935, Pirtûkxaneya Taybet a Abdullah Yaşın.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), mustensix: 'Emer bin Es'ed, tarîxa istinsaxê: 1347/1937.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), mustensix: Taha Ebabekrê 'Elîyê Wanî, sala istinsaxê 1355/1937 cihê istinsaxê: Zaxo.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), mustensix: Mele Mustafayê Posifî, tarîxa istinsaxê: 1357/1937.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), mustensix: Mele Tahayê Kovlî, tarîxa istinsaxê: 1369/1949.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), nusxeya ku Gîwî Mukriyanî di 1964an de li Hewlêrê çap kiriye.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), mustensix: Mela Menaf kurê Mele Qasimê Birîfkî, Pirtukxaneya Melbendî ya Zankoya Dihokê, hejmar: 53.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), xwedî: Ebdusselam Murad Nacî, Celadet Elî Bedirxan bo M. Elî Ewnî rêkiriye. Bexda

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), mustensix: Mele Mihemed Emînê Sêkanî, Pirtukxaneya Melbendî ya Zankoya Dihokê, hej. 41.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), mustensix: Mihemed Elî 'Emer, Pirtukxaneya Melbendî ya Zankoya Dihokê, hej. 66.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), mustensix: Hecî Mela Se'îdê Şûşî, Pirtukxaneya Zankoya Dihokê hej. 32.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), Bexda, Pirtûkxaneya Seddam, jimare: 36089.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), Bexda, Pirtûkxaneya Seddam, jimare: 19740.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), Arşîva Berlînê, jimare: Ms. or. quart. 1131.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), nusxeya ku di jimarên 35-58ên kovara Hawarê de derçûn.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), xwedî: Enwer Mam Zaxoyî.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), xwedî: Mele Muhemedê Botî Bizêvkî.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), xwedî: Enwer Maî.

Cizîrî, *Dîwan* (nusxeya destnivîs), xwedî: Enwerê Mayî, navê mustensix û tarixa istinsaxê tuneye.

2.2. Çapên Dîwanê

Cezirî, Molla Ahmed-i, *Divan*, latînîze. Selman Dilovan wer. bi tirkî: Osman Tunç, Kültür Bakanlığı, İstanbul 2012.

Cezirî, Molla Ahmed-i, *Divan*, wer. bi tirkî: Osman Tunç, Kent, İstanbul 2007.

Cizîrî, Melayê, *Der Kurdische Diwan des Schech Ahmed von Geziret îbn Omar Gennant Mala'i Gizri*, nşr. Martin Hartmann, S. Calvary&Co, Berlin 1904.

Cizîrî, Melayê, *Dîwan*, amd. Emîn Narozî, Avesta, Stenbol 2012.

Cizîrî, Melayê, *Dîwan*, amd. Gîwî Mukriyanî, Hewlêr 1946.

Cizîrî, Melayê, *Dîwan*, amd. Sadiq Behadîn Amêdî, Bexda 1977.

Cizîrî, Melayê, *Dîwan*, amd. Tehsîn Îbrahîm Doskî, Nûbihar, Stenbol 2013.

Cizîrî, Melayê, *Dîwan*, amd. Tehsîn Îbrahîm Doskî, Spîrêz, Duhok 2000.

Cizîrî, Melayê, *Dîwan*, amd. Z. Kaya û M. Narozî, Roja Nû, Stockholm 1987.

Cizîrî, Melayê, *Dîwan*, amd. Zeynelabidîn Zinar, Firat, Stenbol 1992.

Cizîrî, Melayê, *Dîwan*, latînî. Selman Dilovan wer. bi tirkî: Osman Tunç, Nûbihar, Stenbol 2008.

Cizîrî, Melayê, *Dîwan*, transkrîpt. Arif Zêrevan, Stockholm 2004.

Cizîrî, Melayê, *Dîwana Melê*, nşr. Qedrî Cemîl Paşa, (di nav Kovara Hawarê de, jimar: 35-57) Şam 1941-1943.

Cizîrî, Melayê, *Dîwanî 'Arifî Rebbanî Şêx Ehmedî Cizîrî Meşhûr be Melay Cizîrî*, Surush, 1982.

el-Cezerî, Şeyx Ehmed, *Dîwanu'ş-Şeyx Ehmed el-Cezerî*, nşr. Muhammed Şefîq Erwasî, Şehzadebaşı Ewqaf-i İslamiyye Matbaası, İstanbul (1338-1340/1919-1921)

el-Cezerî, Şeyx Ehmed, *Dîwanu'ş-Şeyx Ehmed el-Cezerî*, nşr. Muhemmed Nûrî, Daru'l-Kitabi'l-Erebî, Qahîre (bê tarîx). Doskî, Muhemmed Emîn, Şîrovekirina Dîwana Melayê Cizîrî, Spîrêz, Duhok 2008.

Mukriyanî, Gîw, *Dîwana Melayê Cizîrî*, Erbîl 1964.

2.3. Şerhên Dîwanê

Doskî, Muhemmed Emîn, Şîrovekirina *Dîwana Melayê Cizîrî*, Spîrêz, Duhok 2008.

el-Cezerî, Ebdusselam, *Şerhu Dîwani'ş-Şeyxi'l-Cezerî*, amd. û şîrove: Tehsîn Îbrahîm Doskî, Spîrêz, Duhok 2004.

ez-Zivingî, Ahmed îbn Mela Muhammed, *el-Iqdu'l-Cewherî fî Şerhî Dîwani*'ş-*Şeyxi*'l-*Cezerî*, 2 cîld, Matbaatu Rafideyn, Qamişlo 1958.

ez-Zivingî, Ahmed îbn Mela Muhammed, *el-Iqdu'l-Cewherî fî Şerhî Dîwani*'ş-*Şeyxi*'l-*Cezerî*, Nûbihar, Stenbol 2013.

Nacî, Mela Ebdusselam, Şerhu'd-Dîwani'ş-Şeyx el-Cezerî, Spîrêz, Duhok 2004.

Sadiqî, Şefî'ê, *Tercome ve Şerhê Farsiyê Dîwanî 'Arifê Rebbanî Şêx Ehmedê Cizîrî: Melayê Cizîrî,* Huseynê Esl, Tehran 1389.

Septioğlu, Abdulmukit, *Melayê Cizîrî Divanı'nın Şerhi,* Nûbihar, İstanbul 2005.

Şerefkendî, Ebdurrehman (Hejar), *Dîwanî Arifî Rebbanî Şêx Ehmedî Cizîrî Meşhûr be Melayê Cizîrî*, Neşrê Panîz, Tehran 1393.

Yöyler, Celadettin, *Şîroveya Dîwana Melayê Cizîrî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2006.

Zivingî, Mela Ehmedê, *Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, amd. û wer. Emîn Narozî, Avesta, Stenbol 2013.

2.4.Wergerên Dîwanê

Cezîrî, Mulla Ehmed (Melayê Cezîrî), *Divan Gazêlêy*, wer. bi rûsî: Kerîmî R. Eyyubî, St Petersburg 1994.

Cizîrî, Mela Ehmed, *Dîwan*, wer. bi tirkî Osman Tunç, Nûbihar, Stenbol 2009.

Cizîrî, Molla Ahmed, *Dîwan*, wer. bi tirkî Osman Tunç, T.C.Kültür Bakanlığı Yay., İstanbul

el-Cezerî, Mela Ehmed, el- Tercumetu'd-Dîwanu'l-Cezerî, wer. bi erebî Tewfîq el-Huseynî, Metbuatu'l- Kitabi'l-'Erebî, Dimeşq 1989.

2.5. Pirtûkên Lêkolînê

Alkış, Abdurrahim, *Melayê Cizîrî'nin Dîvânında Tasavvufî Mazmunlar*, Nûbihar, İstanbul 2014.

Doru, M. Nesim, *Melayê Cizîrî Felsefi ve Tasavvufi* Görüşleri, Nûbihar, İstanbul 2012.

Doru, M. Nesim, *Melayê Cizîrî Hakikat ve Mecaz Arasında Bir Sûfî'nin Portresi*, Nûbihar, İstanbul 2016.

ed-Doskî, Muhemmed Emîn, *Felsefetu'l-Işqi'l-Îlahî*, Akademiyî Kurdî, Erbîl 2010.

Kerîmî, Eyyubî, Qewa'idu'l-Luxetî fî'ş-Şi'ri'l-Cezerî, Rusya. ?

Mîkaîl, Nayîf Tahir, *eş-Şeyxu'l-Cezerî Nehcuhu we Eqîdetuhu min Xîlalî Dîwanîhi'ş-Şi'ryyi*, Spîrêz, Duhok 2005.

Muhammed, Halid Cemil, *Melayê Cizîrî Sevgi ve Güzelliğin Şairi*, çev. Ümit Demirhan, Hîvda, İstanbul 2008.

Muhemmed, Xalid Cemîl, *el-Cezerî: Şa'iru'l-Hub we'l-Cemal*, Daru'l-Zeman, 2006.

Nêrweyî, Hisên Usman 'Ebdurrehman, *Xwandineka Hêrmînotîkî bo 'Qesîda Hê di ber Qalû Belayê' ya Melayê Cizîrî*, Ekadîmyay Kurdî, Erbîl 2014.

Omer, Fazil, Cizîrî û Desthelat Berev Tiyoriyeka Kurdî bo Desthelatê, Dezgeyê Nalbend, Dihok 2017.

Resul, Îzedîn Mustefa, Melayê Ciziri, Ştêk Derbarey Jiyan û Berhemî, Hewlêr 1990, Zankoy Selahedîn.

Reşîd, Mes'ûd Cemîl, *Rolê Tewerên Helbijartin û Rêzkirinê di Çêkirina Rîtma Hozana Klasîkî ya Kurdî da: Dîwana Melayê Cizîrî weku Nimûne*, Ekadîmyay Kurdî, Erbîl 2014.

Şivan, Îbrahîm Ehmed, *Ferhengî Sofîyaney Dîwanî Cizîrî û Mehwî*, Hewlêr 2012.

Turan, Abdulbaki, *Melayê Cizîrî Divanı ve Şerhi*, Nûbihar, İstanbul 2010.

Xeznedar, Me'rûf, *Melayê Cizîrî Şitêk Derbarey Jiyan û Berhemî*, Hewlêr 1990.

Zivingî, Safiye, *Cemaliyat ed-Delalati's-Sûfiyye fî el-Mu'cemi'l-Luxewiyye li Dîwani'l-Cezerî*, Soran, Berlîn 2017.

2.6.Tez

Arslan, Ahmet, *Melayê Cizîrî*, Yüksek Lisans Tezi, Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Diyarbakır 2013.

Cebraîlî, Helmet, *Kaveşî der Evzanê 'Erûziyê Eş'arê Melayê Cizîrî ve Tetbîqê An ba Erûzê Farisî ve Erebî*, Karşinasiyê Erşed, Danişkedeyê Edebiyat ve Ulumê Însanî, Danişgahê Kurdistan, 1394.

Ebdulla, Helîma Xurşîd, *Berawirdeyeka Kêşnasî di Navbera Erûza Kurdî û Farisî Dîwanên Melayê Cizîrî û Hafizê Şîrazî wek Nimûne*, Spîrêz, Duhok 2011.

Ehmed, Şe'ban Şe'ban, Şêwazî Şi'rî Cizîrî, Nameyî Master, Kolîjî Adab Zankoyî Selaheddîn, Erbîl 2002.

Mehmûd, Salar Ezîz, *Karîgerî Se'dî le Şi'rekanî Melayî Cizîrî da,* Nameyî Master, Kolîjî Adab Zankoyî Selaheddîn, Erbîl 1999.

Nevvab Temel, *Ahmed el-Cezerî'nin Divân'ında Nûr Kavramının Felsefî/Tasavvufî Temelleri*, Yalova Üniversitesi, Yalova 2017.

Öz, Ruhullah, *Molla Ahmed el-Ciziri'nin Divan'ında Kelami Konular*, Yüksek Lisans Tezi, Harran Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Şanlıurfa 2013.

Rizayî, Bihare, *Berresî Şi'rê Ayîneyî der Asarê Şa'iranê Kurd (Mehwî, Mewlewî, Mela*

Mehmûdê Bêxûd, Melayê Cizîrî), Karşinasiyê Erşed, Danişkedeyê Edebiyat ve Ulumê Însanî, Danişgahê Razî, 1395.

Tayfur, Mehmet, *Melayê Cizîrî Hayatı Divanı ve Tasavvufi Görüşleri*, Yüksek Lisans Tezi, Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Diyarbakır 2013.

Usman, Newzet Ehmed, *Ronbêjî le Şî'rî Klasîkî Kurdî da be Nimûney Melayî Cizîrî û Nalî*, Nameyî Master, Kolîjî Adab Zankoyî Selaheddîn, Erbîl 1991.

2.7. Gotar

Amêdî, Sadiq Behaeddîn, "Serhostayê Kêş û Vehandinê Melayê Cizîrî", *Govarî Korî Zanyarî Kurd*, b. 2, 1975, rr. 359-416.

Amêdî, Sadiq Behaeddîn, "Serhostayê Kêş û Vehandinê Melayê Cizîrî", *Govarî Korî Zanyarî Kurd*, b. 3, 1975, rr. 97-154.

Amêdî, Sadiq Behaeddîn, "Serhoşayê Kêş Vehandinê Melayê Cizîrî", *Govarî Korî Zanyarî Kurd*, b. 1, 1975, rr. 243-302.

Bîdekî, Hadî, "Te'sîrpezîriyê Melayê Cizîrî Ez Hafizê Şîrazî Der Mezmunê 'Eşq", *Neşriyeyê Edebiyatê Tetbîqî*, Daneşkedeyê Edebiyatê 'Ulûmê İnsanî, Danişgahê Şehîd Bahonar Kirman, sal, 9, şomare 14, behar û Tabestan 1396.

Çeçen, Halil, "Orijinal Poetic Form in Mela Ahmedê Jaziri's Diwan", International Journal of Sciences: Basic and Applied Research (IJSBAR), ISSN: 2307-4531, rr. 196-209.

Doru, M. Nesim, "Berawerdkirina Dîwana Melayê Cizîrî û Dîwana Seyîd Qedrî Haşimî ji Aliyê Hizra Tesewufî ve", *Nûbihar Akademi*, 5/3, 2016, ss. 66-81

Doru, M. Nesim, "Melayê Cizîrî'nin Düşüncesinde Hakikat ve Mecaz'ın Ontolojik ve Epistomolojik Boyutu", İslami İlimler Dergisi, cîld: 8, jimar: 1, 2013, rr. 295-310.

Doru, M. Nesim, "Mevlâna Celaleddîn Rûmî ve Melâyê Cizîrî'nin Düşüncesinde Varlığın Kaynağı ve Varoluşun Sırrı Olarak Aşk", *Mukaddime*, cîld: 7, jimar: 1, 2016, rr. 53-71.

Erdoğmuş, Hatip, "Molla Mehmet Demirtaş ve Melayê Cizîrî'de Naat", *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, ISSN: 2147-7655, cîld: 2, jimar: 1, 2014, rr. 187-195.

Hartmann, Martin, "Li Ser Edebiyata Kurdî & Melayê Cizîrî", *Nûbihar Akademî*, (wer. Abdullah İncekan), c. 1., jimar. 3., s. 2., 2015, r. X-X

Jaziri, Malaye, "In Praise of Sharaf Khan: On Sufi Teachings." *In Qasida Poetry in Islamic Asia and Africa*, (Edited by Stefan Sperl and Christopher Shackle), Vol. 2, rr. 244–251, 447-449. Leiden E.J. Brill, New York 1996.

Kavak, Abdurrahman, "Melayê Cizîrî Divân Şerhleri Arasında el-İkdu'l-Cevherî fî Şerhi Dîvan'ş-Şeyhi'l-Cezerî Adlı Eser", *Bingöl Üniversitesi İlahiyat Fakültes Dergisi/ BÜİFD*, cîld: 1, jimar: 2, 2013, rr. 53-67.

Kavak, Abdurrahman, "Melayê Cizîrî ve Tasavvufî Kürt Edebiyatının Gelişim Dönemi", *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, sal:1, cîld: 1, jimar: 2, Kasım 2015, rr. 48-66.

Kezzazî, Mîr Celaleddinê & Xeyriye, Behrooz, "Pîr Der Dîwanê Hafez ve Şi'rê Şairanê Kurd", *Motaleatê Edebiyatê Tetbiqi*, Feslê Heftom, Şomare, 26, Tabistan, 1392, 115-140.

MacKenzie, D. N., "Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran", *Zend*, wer. Samî Berbang, jimar: 9, r. 88, 2006.

MacKenzie, D. N., "Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran", *Nûbihar Akademî*, (wer. Abdullah İncekan), c. 1., jimar: 6, 2016, r. 130-133.

Mahmud, Lokman, "el-Cezerî Muessîsen li Şî'ri'l-Kurdî el-Klasîkî", *Serdem el-Erebî*, jimar: 23, 2009.

Motabçî, Emîn Elî Se'îd, "Melayê Cizîrî Ustadî Xezelî Kurdî le Şêwey Kurmancî Şimalî da", *Govarî Korî Zanyarî Kurd*, b. 25-26, 1994, rr. 3-29.

Shakely, Farhad, "Aesthetic Aspects in The Poetry Of Mala-Ye Jaziri", *International Journal of Kurdish Studies*, January 2002.

Shakely, Ferhad, "Melayê Cezîrî Şiirinin Estetik Boyutları", çev. Ayet Aram, dnd. Muhammed, Halid Cemil, *Melayê Cizîrî Sevgi ve Güzelliğin Şairi*, çev. Ümit Demirhan, Hîvda, İstanbul 2008.

Sönmez, Nesim, "Hâfız-ı Şîrâzî - Melayê Cizîrî Karşılaştırması (Aşk, Gül, Bülbül, Rinde, Züht Ve Dini Semboller Açısından)", Journal of International Social Research . Oct2015, Vol. 8 Issue 40, p. 137-149.

Turgay, Nurettin, "Ahmed el-Botî el-Cızîrî ve Divanında Kur'an'a Yaklaşımı", *Mukaddime*, cîld: 4, jimar: 4, 2011, rr. 139-157.

Yılmaz, Mehmet, "Mela Ahmedê Cizîrî'nin Kültür Dünyası", *The Journal of Academic Social Science Studies (IASSS)*, Vol. 5 Issue: 1, rr. 259-271, February 2012.

"Berawerdkirina Dîwana Melayê Cizîrî û Dîwana Seyîd Qedrî Haşimî ji Aliyê Hizra Tesewufî ve", *Nûbihar Akademi*, 5/3, 2016, ss. 66-81

"Schools of Islamic Philosophy in Melayê Jizîrî's Dîwan", *Beytulhikme An International Journal of Philosophy*, vol:6, Issue: 2, 2016, pp.19-39

"Molla Ahmed el-Cezerî/Melayê Cizîrî", (*Doğudan Batıya Düşüncenin Serüveni-Osmanlı'da Felsefe ve Aklî Düşünce-*, ed: Bayram Ali Çetinkaya, İnsan Yay., İst., 2015 içinde), s.797-822.

2.8. Beşên Pirtûkan

2.8.1. Bi Kurdî

Adak, Abdurrahman. *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, (çap 3), Nûbihar, Stenbol 2013, "Melayê Cizîrî", r. 208-232.

Anist, Bergî Yekem, Tehran, 1364. "Melayê Cizîrî û Şêyxê Îşraq", r. 92.

Balî, A. Antolojiya Helbestvanên Kurd, Pelê Sor, Stenbol 1992

Ebdurreqîb Yusiv, *Dîwana Kurmancî*, Necef, 1972, "Du Helbestên Melayê Cizîrî Digel Hevpeyvîna Feqiyê Teyran", r. 16-20 û 21-42.

Ehmed Qerenî, *Rewşenbîrîya Çiya*, Perta Yekê, Hewlêr 1992, "Xwandingeha Cizîrî", r. 12-17.

Elaeddîn Seccadî, *Mêjûy Edebî Kurdî*, çap 1, Bexda, 1952. "Melayê Cizîrî": r. 155-179; çap: 2 Bexda 1971, r. 197-204.

Es'ed 'Edo, *Pênasî Beşêkî Şa'iranî Kurd, Bexda, 1980.*

Heme Se'îd Heme Kerîm, *Dîdarî Şê'rî Klasîkî Kurdî*, Bexda 1986, "Remzekanî Sofîgerî le Şê'rî Klasîkî Kurdî Nawçey Behdînan da", r. 195-242.

Kurdo, Qenat, Tarîxa Edebyeta Kurdî, Özge 2011, "Meleyê Cizîrî", r. 90-102.

Me'rûf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, berg 2, Aras, Hewlêr 2001, r. 243-290.

Muhammed Nûrî 'Arif, *Têkstî Edebî Kurdî-Honrawe,* Beşî Duyem, Bo Salî Yekem Zankoy Silêmanî, Kolejî Adab, Çapxaney Zankoy Silêmanî, 1981. *"Melayê Cizîrî", r. 165-210.*

Muhemmed Elî Qeredaxî, *Bojandnewey Mêjûy Zanayekanî Kurdî le Rêgay Destxetekanîyanewe,* Bergî Duwem, Bexda, 1999, r.238.

Muhemmed Elî Qeredaxî, *Bojandnewey Mêjûy Zanayekanî Kurdî le Rêgay Destxetekanîyanewe,* Bergî Yekem, Bexda 1998, "Dîwanî Melay Cizîrî", r. 181.

Muhemmed Salih Îbrahîmî Muhemmed (Şepol) *Jînawerî Zanayanî Kurd le Cihanî İslametî ya Gencîneyê Ferheng û Z*

Nafi' Akreyî, *Çend Şa'irek Di Herêma Behdînan de*, Bexda 1978, "Melayê Cizîrî", r. 9-24.

Qaçaxê Murad, *Mêjûy Edeb,* "Xwendina Lîteraturayê-Bona Zersexanêt (8-7), Erîvan, 1973.

Sadiq Bahaeddînê Amêdî, *Hozanvanêt Kurd*, Bexda 1980, "Melayê Cizîrî", r. 25-175.

Sağnıç, Feqî Huseyn, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2002, r. 375-386.

Sedîq Borekey (Sefîzade), *Mêjûy Wêjey Kurdî,* Bergî Duyem, çap 1.r. 137.

Sedîq Sefîzade Borekeyî, Mêjûy Wêjeyî Kurdî (du berg), Întîşaratê Nacî, Bane 1375/1997.

Uzun, Mehmed, *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, Aram, Stenbol 2003.

Zinar, Zeynelabidîn, Nimûne ji Gencîneya Çanda Qedexekirî, Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Stokholm, 1991.

2.8.2. Bi 'Erebî

Bedirxan, Rewşen, *Sefehat Min el-Edeb el-Kurdî,*"Melayê Cizîrî" Beyrût 1954, r. 10-11.

